Îrlanda

An Roinn Dlí agus Cirt,
Gnóthaí Baile agus Imirce
Department of Justice,
Home Affairs and Migration

euaa
EUROPEAN UNION
AGENCY FOR ASYLUM

# TIŞTÊN KU HÛN HEWCE NE KU DERBARÊ EURODACÊ DE BIZANIBIN



KURDISH (KURMANJI)

## ÇIMA EZ VÊ BROŞÛRÊ WERDIGRIM?

Hûn vê broşûrê werdigirin ji ber ku pêdivî ye ku daneyên we yên biyometrîk ji hêla rayedaran ve werin girtin.



Daneyên biyometrîk tê wateya şopa tiliyên we û wêneya we.



Ev agahî, digel daneyên nasnameya we û agahdariyên din ên têkildar, dê ji bo databasa Eurodacê werin veguheztin.

Mafên we di vê pêvajoyê de û tiştên ku ji we têne hêvîkirin di vê belavokê de têne ravekirin.

## EURODAC ÇI YE?

Eurodac databeseke Ewropî ye ku agahiyên li ser hin kategoriyên mirovên ku dikevin welatên YE+ qeyd dike û berawird dike. Ev kategori di vê broşûrê de hatine ravekirin.

Ev databas ji hêla 31 welatên YE+ ve tê bikar anîn ku dikarin daneyên we pêvajo bikin û agahdariya we bistînin. Eger hûn bê destûr seyahetê welatekî din ê YE+ bikin û daneyên we dîsa werin girtin, hemû daneyên ku di Eurodacê de li ser we hatine hilanîn dê ji bo rayedarên wî welatî xuya bibin. Di hin rewşan de, daneyên we dê bi agahdariya nû werin nûve kirin.

## KÎJAN WELATÊN YE+ LI WIR IN?

**Tu niha li Îrlanda î ku welatekî YE+ yê ye.**
**Welatên Yekitîya Ewropayê+ ev in:**

27 Dewletên Endam ên Yekîtiya Ewropayê (EU): Awistirya, Belçîka, Bulgaristan, Kroatya, Qibris, Çekya, Danîmarka, Estonya, Fînlandiya, Fransa, Almanya, EUwnanistan, Macaristan, Îtalya, Letonya, Lîtvanya, Lûksembûrg, Malta, Hollanda, Polonya, Portekîz, Komara Îrlandayê, Romanya, Slovakya, Slovenya, Spanya, Swêd û

4 welatên din: Îslenda, Liechtenstein, Norwêj, Swîsre.

## ARMANCA EURODAC ÇI YE?

Pênc armancên sereke yên Eurodac hene:

- ji bo alîkariya welatên YE+ bikin ku biryar bidin ka kîjan welat berpirsiyarê lêkolîna serlêdana parastina navneteweyî ye
- ji bo ku alîkariya şopandina koçberiya qanûnî û neqanûnî ber bi welatên YE+ ve bike
- ji bo danûstandina agahiyan di navbera rayedarên neteweyî de û pêşîgirtina li sûc û terorîzmê
- ji bo ku piştrast bike ku zarokên ku digihîjin Ewropayê dikarin werin şopandin û parastin
- ji bo misogerkirina ku databasên din ên Ewropî yên ku agahiyên wekî vîzeyan dihewînin bi rêkûpêk dixebitin.



## AGAHIYÊN KÊ DI EURODACÊ DE TÊNE RAGIRTIN?

Eurodac daneyên li ser kesên ku ne welatiyên welatên YE+ ne digire û:

- wan daxwaza piştgirîya navneteweyî kirine
- ew bê destûr ketine nav sînorên welatekî YE+
- piştî ku li deryayê hatin rizgarkirin, ew ji bo welatekî YE+ hatine veguhastin
- bi awayekî neqanûnî li welatekî YE+ dimînin
- bi rêya nexşeya ji nû ve bicihkirinê ya YE an jî bi rêya nexşeya qebûlkirina mirovî ya YE an jî nexşeya ji nû ve bicihkirinê ya neteweyî ketine welatekî YE+
- parastina demkî wergirtine.

## KÎ DIKARE DANEYÊN MIN BIBÎNE?

Rayedarên penaberiyê yên neteweyî li welatê YE+ dê daneyên we yên biyometrîk bigirin û ligel daneyên din ên têkildar ji Eurodacê re bişînin û encama berawirdkirinê werbigirin.

Ajansa Ewropî ya Hevkariya Bicîhanîna Qanûnê û polîsên neteweyî dikarin ji bo pêşîlêgirtina, tespîtkirin û lêpirsîna sûcên giran û terorîzmê daxwaza gihîştina Eurodacê bikin. Ew dikarin daneyên we di Eurodacê de bigerin.

**GIRÎNG!** Rayedarên welatê we nikarin bigihîjin vê agahiyê.

## EGER EZ RED BIKIM KU ŞOPA TILIYÊN XWE BIDIM ÇI DIBE?



Ji aliyê qanûnê ve hûn mecbûr in ku daneyên xwe yên biyometrîk bidin.

Sedemên girîng hene ku çima şopa tiliya we hewce ye. Eger te serlêdana penaberiyê kiribe, ev gaveke pêwîst di pêvajoyê de ye.

Agahiyên şopa tiliyan dikarin di heman demê de ji bo dîtina endamên malbatê li welatên YE+ jî bibin alîkar.

Eger tiliyên we zirar bibînin, di pêşerojê de dîsa şopa tiliyên we dê were girtin.

Eger hûn bi zanebûn şopa tiliya xwe xera bikin, encamên wê yên neyînî dê hebin.

Bo nimûne, heke we serlêdana penaberiyê kiribe, dibe ku pêvajoya nirxandinê were rawestandin.

Eger pêvajoya lêkolînê di doza we de were rawestandin, ev tê wê wateyê ku hûn êdî wekî daxwazker (penaxwaz) nayên hesibandin. Tu dê hemû mafên têkildarî vê rewşê, niha û di pêşerojê de, winda bikî.

Rayedarên li welatên YE+ dikarin ji bo bidestxistina daneyên we yên biyometrîk zorê wekî çareya dawîn bikar bînin. Dibe ku ew we wekî çareya dawîn jî bigirin da ku nasnameya we diyar bikin an verast bikin.

Eger hûn red bikin ku li vî welatî şopa tiliyan bidin, dê encamên taybetî hebin.

Redkirina dayîna daneyên şopa tiliya we ji rayedarên vî welatî re sedemek e ji bo ku Ofîsa Parastina Navneteweyî bi awayekî neyekser serlêdana we ya ji bo parastina navneteweyî vekişîne.

## MAFÊN MIN DI DERBARÊ DANEYÊN EURODAC DE ÇI NE?

Her welatekî YE+ xwedî desthilatek e ku karanîna daneyan kontrol dike. Mafê te heye ku bi kontrolkerê daneyan û berpirsê parastina daneyan re têkilî daynî û daxwaza gihîştina daneyên ku di Eurodacê de hatine hilanîn bikin.

Hûn dikarin daxwaza sererastkirina agahdariya xwe bikin, eger hûn hîs dikin ku:

- xelet e û pêdivî bi sererastkirinê heye
- ne temam e û pêdivî bi nûvekirinê heye

Her wiha hûn dikarin daxwaza jêbirina daneyên xwe bikin ger hûn hîs bikin ku

- ew bi awayekî neqanûnî di Eurodacê de hatine qeyd kirin.

Hûn dikarin agahdariyên têkiliyê yên Kontrolkerê Daneyan û Berpirsê Parastina Daneyan li rûpela dawî ya vê belavokê, di bin sernavê **'Agahiyên din ên kêrhatî'** de bibînin.

Eger hûn dixwazin giliyek fermî li ser ka daneyên we çawa têne bikar anîn tomar bikin, hûn dikarin bi rayedariya çavdêriya neteweyî ya xwe re têkilî daynin.

Agahiyên têkiliyê yên rayedariya rêziknameya neteweyî di rûpela dawî ya vê broşûrê de jî hatine dayîn.

# AGAHIYÊN DIN ÊN KÊRHATÎ

## AGAHDARIYA DI DERBARÊ AGAHDARIYÊN TÊKILIYÊ YÊN NIVÎSGEHA KONTROLKERÊ DANEYAN DE

Li jêr hûn dikarin agahdariyên têkiliyê yên nivîsgeha Kontrolkerê Daneyan û Karmendê Parastina Daneyan li vî welatî bibînin.

Kontrolkerê daneyan dikare ji we re agahdar bike ka kîjan daneyên we yên kesane di Eurodacê de têne hilanîn. Eger daneyên we yên kesane bi rêkûpêk nehatine hilanîn, hûn dikarin daxwaza sererastkirina wan bikin.

Eger hûn hîs dikin ku yek ji agahiyên we bi awayekî neqanûnî hatiye pêvajokirin, hûn dikarin bi karanîna agahiyên têkiliyê yên li jêr daxwaza jêbirina wê bikin.

Agahiyên pêwendiyê yên kontrolkerê daneyan ev in: Ofîsa Parastina Navneteweyî, Radestkirina Xizmeta Koçberiyê, 79-83 Lower Mount Street, Dublin 2, D02 ND99 an jî info@ipo.gov.ie

## AGAHÎ LI SER MAFÊN MIJARA DANEYAN

Li vî welatî, mafên we yên taybetî di derbarê karanîna daneyên we yên kesane de hene.

Hûrguliyên têkildarî mafên we yên parastina daneyan dikarin di Siyaseta Parastina Daneyan a Wezareta Dad, Karûbarên Navxweyî û Koçberiyê de werin dîtin ku li https://assets.gov.ie/static/documents/department-of-justice-data-protection-policy.pdf heye. Hûn dikarin bi rêya e-nameyê bi Karmendê Parastina Daneyan ê Wezareta Dad, Karûbarên Navxweyî û Koçberiyê re têkilî daynin: dataprotectioncompliance@justice.ie

## AGAHDARÎ LI SER AGAHDARIYÊN TÊKILIYÊ YÊN RAYEDARÊN RÊZIKNAMEYÊN NETEWEYÎ.

Hûn dikarin agahiyên li jêr bikar bînin da ku bi rayedara rêziknameya neteweyî ya vî welatî re têkilî daynin.

Eger hûn hîs bikin ku yek ji daneyên we yên kesane bi awayekî neqanûnî hatiye bikar anîn, hûn dikarin giliyek fermî li cem dezgeha çavdêriya neteweyî bikin.

Agahiyên pêwendiyê yên Komîsyona Parastina Daneyan ev in: 6 Pembroke Row, Dublin 2, D02 X963 an jî hûn dikarin bi rêya înternetê li https://forms.dataprotection.ie/contact bi wan re têkilî daynin.

Ev belavok tenê ji bo armancên agahdariyê Ye. Ew bi serê xwe maf û mecbûriEUtan çênake. Ajansa Penaberiyê ya Yekîtiya Ewropayê (EUAA) beşa sereke ya vê materyalê peyda kiriye, û ji nû ve hilberandin û guhertina vê belavokê tenê ji bo Dewletên Endam ên YE ji hêla EUAA ve destûr hatiye dayîn. EUAA ji bo rastbûn, naverok, temambûn, qanûnîbûn an pêbaweriya agahiyên ku di vê belavokê de ji hêla Dewletên Endamên YE'yê an ji hêla aliyek sêyemîn a berpirsiyar ve hatine girtin, ti berpirsiyarî an jî erkê qebûl nake. Ne EUAA û ne jî kesek ku li ser navê EUAA'yê tevdigere berpirsiyarê karanîna agahiyên di vê belavokê de ne.

© Ajansa Penaberiyê ya Yekîtiya Ewropayê, 2025